

Ce'fer Berzincî (?-1899)

Kurte

Binemalley Berzincekan, ke binemalleyekin seyidin û nesebyn degerrêtewe ser Fatîmey Zehra û le konewe le gundî Berzincey nawçey Silêmanî Şehrezûr gîrsawnetewe, be dirêjâyî çendin sede, zana û piyawçakî gewreyan têda hellkewtuwe, hendêkyan le zuwewe le Şarezûrewe çûnete Medîne û maweyekî zor bûnête muftî şafî'iyekanî Medîne. Ce'fer Berzincî ke be Ce'ferî duwem dadenrê û yekêke le Berzinceyye nawdarekan û maweyekî zor wêrray muftî şafî'î le Medîne, le şîwêni bawkî xoy, be heman şêweyş naîbî yekêk le wîlayetekanî dewlletî Osmanî buwe. Legell eweş da zanayekî diyarî serdemî xoy buwe û her le serdemî dewlletî Osmanî da derfetî bo rexsawe kitêb çap bikat. Em witare bo yekem car pallpişt be bellgenamey Osmanî û çend serçaweyekî tir, tîşk dextate çend layenêkî jiyanî û mêtjûy mirdinekey be roj û mang û sall aşkira dekat.

Wişey Kîlîlî: Berzinceyyekan, Muftî Şafî'iyekan, Medîne, Sîwas, Ce'fer Berzincî

Cafer Berzencî (?-1899)

Özet

Soyları Fatima Zehra'ya dayanan ve Seyyid ailesi olan Berzencî ailesi, yüzyıllar önce Şehrezur'un Süleymaniye bölgesinin Berzence köyüne yerleşmişlerdir. Yüzyıllar boyunca büyük ilim ve siyaset adamları yetiştirmiş, bunlardan bazıları Şehrezur'dan erken dönemde Medine'ye taşınmış ve uzun süre Medine Şâfiilerinin müftüsü olmuşlardır.

II. Cafer olarak kabul edilen Cafer Berzencî, en ünlü Berzencilerden biriydi ve uzun bir süre Medine'deki Şâfiî Müftüsü ile birlikte babasının yerine geçti ve aynı zamanda Osmanlı vilayetlerinden birinin vekili oldu. Osmanlı İmparatorluğu döneminin onde gelen alimlerinden biri olup, Osmanlı İmparatorluğu döneminde kitap yayılama olanağına kavuşmuştur. Bu makale, Osmanlı belgeleri ve diğer kaynaklara dayanarak ilk kez onun hayatının çeşitli yönlerini öne çıkarıyor ve ölüm tarihini gün, ay ve yıl olarak ortaya koyuyor.

Anahtar Kelimeler: Berzenciler, Müftü Şâfiiler, Medine, Sivas, Cafer Berzencî

Jafer Barzincî (?-1899)

Summary

The Barzanj family, whose lineage goes back to Fatima Zahra, has been settled in the village of Barzanj in the Sulaimaniyah region of Sharazoor. Over the centuries, great scholars and good men have lived there. Ja'far Barzanji, considered Jaafar II, was one of the most famous Barzanjis and for a long time, along with the Shâfiî Mufti in Medina, succeeded his father, as well as the deputy of one of the provinces of the Ottoman Empire. However, he was a prominent scholar of his time and had the opportunity to publish books during the Ottoman Empire. This article, for the first time, based on Ottoman documents and other sources, highlights several aspects of his life and reveals the date of his death in days, months and years.

Keywords: Barzanji, Mufti of Shâfiî's, Medina, Sivas, Jaafar Barzanji



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year: 2024 • Cilt/Volume: 10 • Sayı/Issue: 20

Hemin OMAR AHMAD

heminahmad40@gmail.com

Orcid: 0000-0003-1985-9512

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 20.11.2024

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 06.12.2024

Makale Yayın Tarihi / Published: 29.12.2024

DOI: 10.56491/buydd.1588703

Atif / Citation:

Ahmad, H. O. (2024). Ce'fer Berzincî (?-1899). Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 10(20), 51-60.

<https://doi.org/10.56491/buydd.1588703>

Destpêk

Zanayanî kurd le ber her hokarêk bûbêt; besêkyan le willatî kurdewarî derçûne û le dever û willatî tir nîşitecê bûne. Be taybetî le serdemî dewlletî Osmanî da besî zorî xakî musullmanan le ber destî Osmanîyekan da buwe û bew hoyewe zanayanî kurd wek zanayanî netewekanî tir le kwê wîstibetiyan bijîn lewê nîşitecê bûne. Be hoy karî dewlletîsewe zanayanî kurd naçar bûne willatî xoyan becê bêllin û le şwêni karekeyan bimênnwe, Emeş bo muftî, qazî û dadwer û fermanberanî asayî karêkî siruştî buwe. Legell eweş da sê şwêni zortirîn zanay kurdî le bawes girtuve, ewanîş Beşîda, Istenbul û Hîcaz bûne. Yekemyan wek şwêni nizik le cugrafiyay willatî kurdan buwe û be dirêjayî çendin sede zanay kurdî lêbûne û duwemyan wek nawendî desellatî Osmanî besêk le zana û kesayetîye kurdekanî be hokarî ciya ciya lexogirtuve. Sêyemînîsiyan her dû şarî Mekke û Medîne le ber pîrozîyekeyan her le konewe zanayanî kurd hellweda bûne lewê bimênnwe. Lew bareşewe deyan zanay kurd hen wêrray ewey payeyekî gewrey kargêrrî û zanistîyan lew dû şare da hebuwe, le heman katîş da xelik hebûn ke mucawîrî ew dû şare bûne û ta kotayî jiyanî lewê seryan nawetewe.

Naw û bineckekey

Le nîw zanayanî kurdi da mallbatî Berzinceyiyekean diyartirîn binemallen ke be dirêjayî sêsed sall lew dû şar e mawnetewe, be taybetîş le şarî Medîne payey giringî mîrîyan hebuwe. Diyartirînî em binemalleye Ce'fer Berzincî buwe. Eger çî emey êsta basî dekeyin Ce'fer Berzincî duweme û sede û nîwêk pêşitir Ce'fer Berzincîyekî tirîş hebuwe. Mamosta 'Ebdulkerîmî muderrîs (1900-2005) çend dêrrêkî kurtî lebarewe nûsîwe: Ce'fer kurrî Îsma'il kurrî Zeynel'abîdîn kurrî Mi'hemed Berzincî ye. le Ezher xwêndûyetî serperiştî fermangey fetway Medîney kirduve û komellêk berhemî nûsîwe¹. Wa diyare be gwêrey boçûnî El-Zerkîl nawbraw le Silêmanî yan wîrdtir le Berzince le dayik buwe² û bo xwêndin çote Ezher û dwatir çote Medîne.

Le nîw bellgenamekanî Osmanî da bellgenamegelêk le barey em zanayeman debînrê, ke leber sêberî ew bellgenamane detwanîn çend layenêkî jiyanî bo yekem car aşkira bikeyn.

Ce'fer Berzincî û Muftîyatî:

Be daxewe şîtekî ewto le barey mindallî û serdemî gencî Ce'fer Berzincî le nîw bellgenamekanî Osmanî da nabînrê, ewende heye amaje bewe dirawe ke ew kurrî Îsma'il Berzincîye ke ewîş serdemêk muftî şafî'iyekanî Medîne buwe. (Nazanrê aya eger Ce'fer Berzincî rast bê ke le Silêmanî le dayik bûbê; aya dwatir bawkî hatuve û bote muftî Medîne, yan her le Medîne ledayik buwe û bawkî lew binemallaney ewê buwe? Ême way bo deçîn ke Elzerkîl helley kirdibê û rastîyekey ewe bê ke Ce'fer Berzincî le Medîne le dayik buwe). Em babete pêwîstî be twêjînewey wrdtir heye.

Le bellgenameyek da ke mîjûy 09.06.1278î koçî leser nûsrawe, amaje bewe dirawe le ber ewey Îsma'il efendi Berzincî; muftî şafî'iyekanî Medîne nexoş e, bew hoyewe Ce'fer Efendî kurrî le şwêni dademezr³. Her be hoy bellgenameyekewe boman aşkira debêt ke Ce'fer Berzincî le sallî 1279î koçiyewe le şwêni bawkîyewe bote muftî Medîne. Lew bellgenameye da nameyekî Ce'fer Berzincî heye ke mîjûy 7î şe'banî sallî 1297 î le ser nûsrawe û têyda amajey bewe kirduve ke pêş hejde sall, wate sallî 1279 î koçî serperiştî fermangey muftîyatî şafî'iyekanî Medîne û endamî encûmenike buwe û lew sawe xizmet dekat û sallî par ferman dirawe ke dabimezirên, bellam girftêk le damezrandineke heye û dawa dekat ke destubird bikrê û karekey bo rayî bikrê. Nameke zor be şêwazêkî cwan û serincrakêş nûsrawe û le kotayî da xoy be Berzincîzade Ce'fer; muftî şafî'iyekanî Medîne nasanduwe⁴.

Her weha le rojinamey Tercman-i Heqîqetîş da ke mîjûy 18.02.1305î koçî beramber (05.11.1887î mîladî) besereweye, le hewallêk da ke taybete be Medîney Munewere, nawî Ce'fer Berzincî wek muftîyatî şafî'iyekanî şareke hênrâwe.⁵

١ علماؤنا في خدمة العلم والدين، عبدالكريم محمد المدرس، ص ١٣٦.

٢ خيرالدين الزركلي، الأعلام، قاموس تراجم لأشهر الرجال والنساء من العرب والمستعربين والمُستشرين، ج ٢، دار العلم للملائين، بيروت، ط ١٥٠٢، ٢٠٠٢، ص ١٢٢.

3 MB. İ. 00016. 00113. 001

4 SD. 00285. 00033. 004

5 Mektub Mexsus, Medîney munewerden, Tercuman-i Heqîqet, 'Eded 2822, 18.02.1305, Istanbul, s3

Ce'fer Berzincî û Guzeranxirapî

Wek lebellgenamekan da derdekewêt, endamanî xêzanekey jimareyan zor buwe û nizikey bîst kes bûne û bew hoyewe le ëllékî guzeranxirapî da buwe, be taybetî lew katey ke bote muftî Medîne. Boye le bellgenameyek da ke mîjûy 17î Rebî'î duwemî sallî 1297î koçî (Beramber 29.03.1880) le ser nûsrawe, ferman derçuwe ke le ber naçarî û nebûnî, mangane dû Erdeb⁶ genim û pazde qîye sade û bîst qîye birinc û sê qîye qawe û şekir û sabûn bo Berzincîzade Seyid Ce'fer efendî muftî şafî'iyekanî Medîne terxan bikrê⁷.

Ce'fer Berzincî û Name bo Sulltanî Osmanî:

Le nameyek da bo sultânî Osmanî, ke mîjûy 5î Rebî'î duwemî sallî 1297î le ser nûsrawe, nawî sultânî awa hînawî: *Şewketlu muhabbetlu qudretlu sultanul-umem, zillu-llah fil-'alem, muhî turasud-dîn, mueyyiduş-serî'etu seyyîdül-lkewneyîn sultanu nusret meab padışahımız efendimiz weliyîn'met-I 'alem.* lem nameye da amajey bewe dawe ke du'agotan pêş nozde sall (wate le sallî 1278 ewe- dekate beramber dewruberî sallî 1861) le xizimetî fetway şerîf û heremî hezretî Pêxember da ders dedatîwe û hemû katekey bo dersdanewe û mesalîhî xellk terxan kirduwe. Dway tewawbûnî her dersêkîs du'ay temen dirêjî bo padişa û textî selltenet dekat û şerefmed buwe be lutfi şehensâhî be terxankirdinî 750 qurûş mûcê, Cige leme hîç yarmetiyekî nîye û tûşî nebûnîş hatuwe û xanewadekey ziyatir le bîst kes in û lewetey bote muftîş mallekey xallîye le mîwan le ber ewey bew mûcêye natwanê biguzerênê, Eger çî ew le sulaleyi tahîrey hezretî Pêxember û le binemalley zanayan e, eger mangane dû erdeb genim û panze qîye sade û bîst qîye brinc û sê qîye şekir û qawe û sabûnî pê kerem bikrê, ewa şerefmed debê⁸.

Mûçey Ce'fer Efendî

Le bellgenameyek da ke mîjûy 12.04.1304î koçî (Beramber 08.01.1887) le ser nûsrawe, amaje be terxankirdinî birre mûçeyek bo nawbiraw dirawe û ew be zatêkî rîzlegîraw û şayiste nawnirawê û le emaretî celiley Mekkey mukerreme da mangane 631 qurûş û dû parey bo terxan kirabû.

Her le naw dosiyeke da bellgenameyekî dîkey şûray dewllet heye ke amajey bewe dawe Seyid Ce'fer Efendî muftî şafî'iyekanî Medîney munewere birre pareyekî bo terxan kirabû ke le 10 î Rebî'î Duwemî sallî 1298ewe bîryarî le ser dirabû, Emeş legell bîryarî Mucawîrekânî Mekke û Medîne da bû û bîryarî daşikandinî pênciyek û deyek bo hemû mûçexorekan hatibû û bo Seyid Ce'fer efendî ke yekêke le sadat û zanayan û şayanî rîzgirtinêkî zore, ta êsta hîçî bo nekrawe û wa pêwîst dekat mangane birrî 631 qurûş û dû parey le emaretî Mekke da bidrêtê.

Le bellgenameyekî tir da ke mîjûy 11.10.1290 î koçî le ser nûsrawe, nûsraw bo wezaretî darayî kirawe, ke Ce'fer Efendî muftî şafî'iyekanî Medîney munewere û le seyyidekanî Berzince, le ber pêwîstî û guzeranxirapî bîryar dirawe ke mûçekey le 438 qurûşî manganewe, be ziyadbûnî 312 qurûş, bibête 750 qurûş û mûçekey wek mûçey muftî hînemîyekan lêbêt⁹.

Mindallekanî

Le nîew bellgenamekanî Osmanî da le dway mîrdinî Ce'fer Berzincî, bas le mîratekey dekrê ke bo jîn û kiç û kurekanî terxan bikrê, bê ewey nawî hîç kamiyan bihênenê. Le bellgenameyekî tir da ke mîjûy 26.11.1329 î koçî ye, tenya bas le Haşim efendî kurrî Ce'fer Berzincî kirawe¹⁰.

Le bellgenameyekî tir da ke mîjûy 14.09.1314î koçî leser nûsrawe, amaje bewe dirawe ke Şerîfe Teqîye (wa pêdeçê em Şerîfe Teqîye xêzanî Ce'fer Berzincî buwe) kiçî Berzincîzade wefatî kirduwe û bew hoyewe mûçekey dedrête her yek le Şerîfe Zeyneb û Şerîfe 'Ayşe û Seyid Mihemed Haşim efendî kurrî. . xanimî koçkirdû le gencîney dewllet le Medîney munewere da mangane 416 qurûş mûçey hebû, be hoy ewey le sa-

6 Yek Erdeb 24 sa'e û her sa'êkîs sê kilogiram e. (Birrwane Ferhengî Dehxuda)

7 ŞD. 00285. 00033. 006f

8 ŞD. 00285. 00033. 007

9 A. }MKT. MHM. 00469. 00047. 002

10 DH. MTV. 00038. 00034. 001

datî kîram bûn. Wa diyare le rojî mirdinekeyewea müçekey hejmardekirê ke bibête mîrat le layek bo Seyid Mîhemed Haşim efendî û le layekî tir bo Şerîfe Zeyneb û Şerîfe ‘Ayşe be şêweyekî yeksan terxan bikrê¹¹. Lemewe derkewt ke Ce'fer Berzincî dû kiç û kurrêkî hebuwe.

Ce'fer Efendî û Naîbî Sîwas

Wa diyare Ce'fer Efendî maweyek bote Naîbî şarî Sîwas her wek le belgenameyek da hatiwe ke mêtjûy salî 1307 î koçî leser nûsrawe.¹² Herweha be gwêrey belgenameyek Seyid Ce'fer efendî ‘erzuhallêk pêşkeşî şahane kirdibû û bew hoyewe le Medîney munewere da xanuwêkî bo kirrdira û birrêk müçeyşî bo terxan kira. Bellgenameke mêtjûy 23.02.1310 î leser nûsrawe û ke nawî seyid Ce'fer Berzincî be naîbî pêşûtirî Sîwas nawî hatuwe¹³. Em dawayey Ce'fer Berzincî le 4î rebî'î duwemî sallî 1310 buwe û her wek le ‘erzuhalîke da hatuwe ke: Du'agotan le layen padişawe hîftsed û çend qurûşêkî bo terxan kirabû, ca le Medîney muneweres da hîç xanuwêkî destnekewtuwe, le ber ewe xorî lutif û hawkarî padişa hemû layekî girtotewe û bew hoyewe çawerreyî lutfi ewe, le ber ewey mindallî zorin pêwîstî be xanuwêkî heye le Medîne û bo xercîyekeyşî pêwîstî be 1500 ta 2000 lîre heye, ca leber ewey Hacî Behram axa le Babulhemîdîyeey Medîne buwe û xoy xellkî İstanbul buwe û wefatî kirduve û xanuvekey be hezar lîre defroşê û eger xanuy ew be kirêş bigirê sallane 3000 qurûşî têdeçê. . Ca dawa dekat be her corêk bê xanuwêkî le Medîne bo dabîn bikrê¹⁴.

Ce'fer Berzincî û Wergirtinî Paye

Beşêk le kesayetî û berpirsekanî serdemî Osmanî, le ber zanabûnyan yan çalakbûniyan; wek rîzlenanêk paye û mertebey Osmanîyan pê dirawe. Be gwêrey salinamey wîlayetî Hîcaz jimare 1-i sallî 1301î koçî beramber 1884 î mîladî, Ce'fer efendî muftî şafî'iyekanî Medîne, payey Erzirumî pêdarwe ke birîti buwe le sê Mecîdî¹⁵.

Herweha be gwêrey kitêbî Mecmu'etul- ‘Ulum î sallî 1297î koçî (Beramber 1879), Nawbiraw payey Mexrec (Mehrec Payesini) le 17 î Remezanî sallî 1296 î koçî wergirtuwe.¹⁶

Le salnamey wîlayetî Hîcazî sallî 1306/1889î zayıñış da hatuwe, ke Seyid Ce'fer efendî muftî şafî'iyekan, rutbey Bîladî Xemsey wergirtuwe ke sê Mecîdî ye¹⁷.

Le jimare 1266î rojnamey Veqit da, le laperey yekemî da hewallêk billawkrawetewe, ke Berzincîzade fezîletlu Seyid Ce'fer efendî payey Mexrecî Qudsî şerîfi pêdirawê¹⁸.

Berhemekanî

Ce'fer Berzincî xoy le nameyekî bo sultânî Osmanî, ke daway hawkarî kirduve, dway ewey bas lewe dekat ke 30 sall lemewber muftiyatî şafî'iyekanî kirduve û zor be başî xerîkî dersdanewe û billawkrdinewey zanist buwe, herweha bas le berhemekanî xoy dekat, bem şêweye nawyan dehênenê:

Le zanistî Fermûde da em ktêbaney hen:

Kewkebul-Enwar, Taculibtiac, Mesabîhûl-Şurer, Şewahidul-Şufran, Xulasetul-Meqsed, Belaşetul-Meram.

Le zanistî Mêtjûş da em berhemaney heye:

Nuzhetun-Nazirîn, Newafîhur-Rewzul-Etir, Elhîdaye¹⁹.

Le bellgenameyekî tir da ke mêtjûy 28.3.1284î koçî lesere, amaje bewe kirawê ke fezîletlu Ce'fer Efendî muftî Medîney munewere û sadatî ,Elewîyey Hüsêniye, kitêbî Şewahidul-Şufran ,Ela Cilîl-Ehzan û ,Iqdul- Cewher

11 ŞD. 00369. 00030. 001

12 DH. ŞFR. 00150. 0016. 01

13 BEO. 000071. 005278. 001

14 BEO. 000071. 005278. 002

15 Hicaz wilayeti Salinamesî, Birncî def'e, sine 1301, metb'e Hicaz wilayeti, Mekke, s141

16 Mecmu'e ,Ulum, Numru 3, 1 Muârem 1297, Mekteb senayî Şahane Metb'esine, İstanbul, s177

17 Hicaz wilayeti Salinamesî, 1306 sene-i hicriye, def'e 4, Mekke mukereme, s224

18 Veqit, 'Eded 1266, 2/5/1879, İstanbul, s1

19 BEO. 000071. 005278. 004

Fî Mewlidin-Nebîyul-Ezher nawî dû lew kitêbanen ke nawbraw şerhî kirdûn û hêsta çap nekrawin, boye dawa dekat ke le pay ewe; lutfî le beramber bikrê . Bedaxewe besêk lew kitêbaney êsta winin²⁰.

Mamosta ,Ebdulkerîmî Muderrîsîş nawî sê berhemî nawbirawî hêname: Taculibtiac ,Elen-Nurul-Wehhac Fîl-Israî Welmî'rac, Elkewkebun-Nur ,ila ,iqdul-Cewher fî Mewlidin-Nebîyul-Ezher, Nuzhetun-Nazirîn fi Mescidi Seyîdul-Ewwelîn Welaxirîn.

Be gwêrey bedwadaçûnî ême, le serdemî Osmanî da du kitêbî nawbiraw çap kirawn û em ktêbane le kitêbx-anekanî Turkiya da nusxeyan heye, ke birîtin le:

1- Taculibtiac ,Elen-Nurul-Wehhac Fîl-Israî Welmî'rac

Nawî Nûser: Ce'fer bin Esseyid Isma'îl Elmedenî Elberzencî

Çapxane: Metbetul-Hemîdiye, şwêni çap: Qahîre

Sallî çap: 1314. Lapere: 186

Em kitêbe le kitîbhaney Îsam be jimare 153155 parêzrawe.

Seretay kitêbeke awaye:

الحمد لله الذى اختار عبداً مهداً للرسالة وخصه مفاجأة على البراق بالاسراء وعرج به على معارج الكمال الى السموات العلي ليريه من آيات ربه الکبرى الى السدرة المنتهى التي ينتهي اليها علم كل نبى مرسلاً وملك مقرباً وعنهما جنة المأوى الى مستوى سمع فيه صریف الاقلام
بما جرى...

Kotayiyekey:

فقد تم طبع كتاب تاج الابتهاج على النور الوهاج فى الاسراء والمعراج لعلامة عصره ووحيد دهره خاتمة المحققين ونهاية المدققين كاشف لثام المعضلات وشمس ليل المدهفات السيد جعفر بن السيد اسماعيل البرزنجي متعم الله الانام بوجوده واجزل له عظيم فضله وجوده وهو لعمري كتاب اشرقت فى سماء التحقيق نجوم آياته ويزغت فى أفق اپصاخ المشكلات بليغ عباراته كشف أسرار قصة الاسراء والمعراج بلفظ رائق وانتقى لبيان هذا الصدد من النقول كل مفيد....

2- Nuzhetun-Nazirîn Fî Mescidi Seyyîdul-Ewwelîn Welaxirîn.

Jimarey Lapere: 221, Çapxane: Metbetul-Icmaliye. Şiwêni Çap: Qahîre, Sallî Çap: 1332 k/ 1914. Çapî yekemî em kitêbe le çapxaney El-Emîriye buwe le sallî 1303 î koçî û 119 laperre buwe.

Les er bergî kitêbeke weha nûser nasênrâwe:

العام الفاضل الجليل والحرير الكامل النبيل فخر السادة الحسينية الكرام، ومفتى الشافعية بمدينة سيد الانام، الراجلى عفو ربه المعين المنجى
السيد جعفر بن السيد اسماعيل المدنى البرزنجى

Em kitêbe le kitîbhaney Îsam be jimare 152389 parêzrawe.

Wefatî:

Be gwêrey bellgenameyek ke bas le beşe mîratî mindallekanî Ce'fer efendî dekat, amaje bewe dirawe ke nawbiraw le yekî mangî Abî sallî 1315 î Romî koçî dwayî kirduwe. ke dekate beramber 13.08.1899î zayînî. wa diyare her le Medîneyş wefatî kirduwe.

Encam

Ce'fer Berzincî kurî Îsma'îl Berzincî ye ke xoy û bawkî mufty şafî'îyekanî Medîne bûne û le bineret da xellkî Berzincey nawçey Silêmanî Şarezûrin.

Ce'fer Berzincî le lay dewlletî Osmanî rêzlîgîraw buwe û leber eweş pile û payey idarî wergirtuwe, ke diyartînyan naîbî şarî Sîwas buwe.

Nawbraw ziyatir le şes berhemî nûsîwn û tenya duwanyan le serdemî dewlletî Osmanî da çap kirawn.

Ce'fer Berzincî le 13.08.1899 le şarî Medîne koçî dwayî kirduwe.

Serçawekan

1. Kitêb:

- عبدالكريم محمد المدرس، علماؤنا في خدمة العلم والدين، عنى بنشره محمد على القرداغي، الطبعة الاولى، بغداد، ١٣٦٠. ص ١٩٨٣
- خيرالدين الزركلي، الأعلام، قاموس ترجم لأشهر الرجال والنساء من العرب والمستغربين والمستشرقين، ج ٢، دار العلم للملائين، بيروت، ط ٥١، ٢٠٠٢، ص ٢٢١.
- Mecmu'e 'Ulum, numru 3, 1 muherrem 1297, mekteb senayî' şahane metb'esine, Istanbul.
- Veqit, 'Eded 1266, 2/5/1879, Istanbul.
- Ḫicaz wîlaytî Salnamesî, 1306 sene-i hicriye, def'e 4, Mekke Mukereme.
- Ḫicaz wîlaytî salinamesî, birncî def'e, sine 1301, Metb'e Ḫicaz wîlaytî, Mekke.


2. Kodî Bellgenamekan:

- MB. İ. 00016.00113.001
- ŞD. 00285.00033.004
- ŞD. 00285.00033.006
- ŞD. 00285.00033.007
- A. }MKT. MHM.00469.00047.002
- DH. MTV.00038.00034.001
- ŞD. 00369.00030.001
- BEO.000071.005278.001
- BEO.000071.005278.002
- BEO.000071.005278.004
- MVL.00881.00029.001
- DH. ŞFR. 00150.0016.01



٤٦

A rectangular library stamp with a double-line border. The text "OSMANLI ARŞİVİ" is at the top, "BEO" is in the center, and the call number "98 | 7318 | 4" is at the bottom.



شودا دکولت

لَا يَخْلُقُ شَيْئًا

118

اعضاه اعضاه اعضاه اعضاه اعضاه اعضاه اعضاه اعضاه اعضاه



i. 80.84 / 4976

İ.ŞD.00084

T.C. BASBAKANLIK OSMANLI ARSIVI DAIRE BASKANLIGI (BOA) *

SD.00285.00033.007